Destveanîna Mafên Netewî Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

agiri

Hejmar: 134

5'ê Gulan 2010

Buha: 150 Tûmen

Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

## Mamosta Hêjayî Rêzanî Û Jiyanek Baştir İn

Li halekê de ku Mamosta di Îranê de ji destê bêdahatî û kêm îmkaniyê de dinalînin û îzna nerazîbûn û pêkanîna sendîka ên serbxwe jî ninin, komek ji mamosta ên biwêr û biwîjdan di reşçalên rejîmê de ne. Rejîmê bi gotin, 12'ê Banemerê bi roja Mamostayan diyarî kiriye, lê her di wê rojê de hêzên ewlekarî ên rejîmê dikevin debistanan daku pêşî ji nerazîbûnan bigrin. Mamostayî erkek pîroz e û hêjayî rêzgirtin û jiyanek baştir in.

Waşington Taymz:

# Riya Kuştina Mar, Pelixandina Serê wê ye

R: 2

## Ehmedî Nijad Bi Yek Ji Dujminên Sereke Yên Azadiya Çapemeniyê Hat Nasîn



Rêkxistina Nûçegihanên Bêsînor (RSF) bi boneya roja Cîhaniya Azadiya Çapemeniyê, bi nirxandina rewşa ragihandinan, gellek welat dan ber lome û rexneyan xwe. Li vê derheqê de lîsteyek 40 kesî ji siyasetvan û girûpan weşand ku pitir ji hemû kesê azadiya çapemeniyê pêpes dikin.

Dom:2

## Dirûşma "Mirin Bo Ehmedînijad" Di Xwenîşandanên Kabulê De

R: 2




## Alozî Û Kirîz Di Peywendiyên Îran Û Kuwêtê De

R: 2



Rûpel 3

Hevpeyvîna Kovara Sivîl bi Birêz Mistefa



Rûpel 5

Piştî Virran Dor Hat Hirran



Ebdulla Hicab

Rûpel 6

Turkiya, Reformên Destûrî Û Kurd



Selîm Zencîrî

Rûpel 8

Kasibkarên Ku Rojê Sed Car Dimrin Û Dijîn



Ceifer Mubeşirniya

Rûpel 11

Kurdistan Wargeha Stran Û Awazan



Mecîd Cînîkanlo

www.arsivakurd.org

## Semînarek Bi Munasibeta 12'ê Banemer, Roja Xwendekarên Kurd

Roja 2'ê Gulana 2010'an, li hola rêxistinên Demokratîk ên Yekîtiya Nîştimanî a Kurdîstanê, semînarek bi boneya 2'ê Gulanê, Roja Xwendekarên Kurd hat lidarxistin.

Semînar bi beşdariya xwendekaran û mamostayên zanîngehên kurdistanê û hejmarek ji kadro û pêşmergên PDKÎ, bi deqîqeyek bêdengî bo rêzgirtin ji canê pak yê şehîdên rîya rizgariya Kurdıstanê dest pê kir.

Piştre peyama Yekîtiya Xwendekarên Demokrat ên Kurdistana Îranê, ji aliyê Selam Îsmaîlpûr, Sekreterê vê saziyê ve hat pêşkêşkirin.

Dûre Ako Şivanî, mamostayê dîrokê li Zanîngeha Silêmaniyê gotarek bi navê "Rola xwendekarên Kurd di bizava gelê Kurd" de pêşkêş kir.

Di beşekî din a vê semînarê de, Teymûr Mistefayî, endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ gotarek di bin navê " Rola xwendekar û qata akadîmîstan di dîroka PDKÎ de" pêşkêş kir.

Gotara dawî a semîrarê di bin navê





"Xesarnasiya têkeliyên navbera bizava xwendekarên seranserî û xwendekarên kurd di Îranê de", ji aliyê Hejar Rehîmî, mamostayê zanîngehê ve hat pêşkêşkirin.

## Riya Kuştina Mar, Pelixandina Serê Wê Ye



Rojnameya Waşington Taymiz derheq riyên berbirûbûna Komara Îslamî re nivîsand "Take Riya Kuştina Marek, Birrîna Serê Wê Ye". Çunku nermînîşandan, pêşî li dujminên me nagire.

Rojnameya han dide zanîn ku me di derbazbûyî de dildanewe ji dîktarorên wekî serokkomarê rejîma Îranê kiriye, lê me encamên trajedîk bidest xistine. Lewra niha divêt em berxwe bidin û gefan berî rûdana bûyer û karesatan bisekinînin.

Waşington Taymiz"ê bi pirsiyarekê domandiye ku gelo divêt 11'ê îlonek din biqewime heya ku em hişyar bibin. Paşan dibêje ku divêt em gavên pêwîst bi sepandina dorpêçên abûrî dest pê bikin heya ku pêşî ji gihîştina rejîma Îranê bi armancên xwe bigrin. Destdagirtin bi ser cîhanê de, alozî û kawikarî ji armancên rejîma Îranê ne. Rojname bi îşarekirin bi wê yekê ku xelkê Îranê goriyê kiryarên desthilatdarên Îranê ne û hewce ye bo çareseriya wê pirsgirêkê em destbikar bin. Lewma take riya kuştina Marekê serbirrîna wê ye.

## Ehmedînijad Bi Yek Ji Dujminên Sereke Yên Azadiya Çapemeniyê Hat Nasîn

Rêkxistina Nûçegihanên Bêsînor bi boneya roja Cîhaniya Azadiya Çapemeniyê, bi nirxandina rewşa ragihandinan, gellek welat dan ber lome û rexneyan. Li vê derheqê de lîsteyek 40 kesî ji siyasetvan û girûpan weşand ku pitir ji hemû kesê azadiya çapemeniyê pêpes dikin. Lîsteya han navê 17 Serokkomar û Serok Wezîran weke HO Cîn Tawo, Serokê Dewleta Çînê, Viladimîr Potîn, Serokwezîrê Rûsiya, Muemer Qezafî Serokkomarê Lîbyayê, Mehmûd Ehmedî Nijad Serokkomarê Îranê tên dddîtin.

Lê kîjan Azadî û kîjan çapemenî li Îranê de? Îsal di halekê de rojnamevanên Îranê vê rojê pîroz dikin ku gelek ji wan yan li girtîgehan de ne, yan neçar bi derketin ji Îranê bûne, yan jî bêkar û bêmaf ji vî karî hatine kirin. Fezaya hakim bi ser çapemenî û medyayan li Îranê de bi qasekê tund e ku derfeta bênkişandinê jî tu ninin. Sansor û xwe sansorî, daxistina rojname û kovaran, zext û givaşên malî li ser wan, gefxwarin, girtin, îşkence, kuştin û bêmafkirina rojnamevanan diyariyê rejîma Îranê û Serokkomar Ehmedînijad e bi rojnamevanan in Di heman hal de 'Firîdom




Haws" bi vê minasibetê raporek li ser rewşa çapemeniyê di Îranê de weşand ku li gorî wê, Îran di rêzbenda 187'an de ye û wek salên berê di refa welatên ne azad de cih girtiye ku zêdetirîn binpêkirin dij bi rojnamevanan encam daye. Li gorî wê raporê tenê Ozbekistan, Kureya Bakûr, Turkmenistan û Birme rewşek xirabtir ji Îranê hene.

Sala borî Îran di refa 181'an de bû.

Herweha saziya "Mala Azadiyê"jî, Komara Îslamî a Îranê di nav 10 welatan herî neazad de cih daye ku zêdetirîn givaş li ser azadiya ragihandinê pêkanîne. Ku pêkhatine ji: Bilarûs, Kûba, Îkvador, Êrîtire, Birme, Kureya Bakûr, Turkmenistan û Ozbekistan.

## Alozî Û Kirîz Di Peywendiyên Îran Û Kuwêtê De



Derheq eşkerebûna girûpek sîxoriyê a ser bi Sipaha Pasdaran a Îranê li Kuwêtê de, hejmarekî zaf ji endamên Perlemantoya Kuwêtê xwazyarê derkirina balyozê rejîma Îranê ji wî welatî bûn.

Endamekî Perlemana Kuwêtê di wê derheqê de da zanîn ku: Em xwazyarê ragirtin û betal kirina hemû rêketinnameyên bi rejîma Tehranê ne. Hewceye ku dewlet balyozê me ji Îranê vexwîne û balyozê Îranê jî derxîne.

Rojnameya Kuwêtî a Alqubs nivîsand ku: Toreke sîxoriyê a girêdayî bi Spaha Pasdaran li Kuwêtê hat eşkerekirin. Endamên wê girûpê di çarçoveya karên pizîşkî, torîstî û dîtina nawendên mesebî de bo sîxoriyê bi berdewamî hatine Kuwêtê.

## Dirûşma "Mirin Bo Ehmedînijad" Di Xwenîşandanên Kabulê De

Li gorî çavkaniyan, li Kabulê hejmarek ji Efxaniyan li ber deriyê Balyozxaneya Komara Îslamî nerazîbûna xwe derhq riftarên nebaş yên rejîma Îranê bi penaberên Efxanî re dan nîşandan. Xwenîşanderan dirûşmên dijî rejîmê û bitayebt li dijî Serokkomar Ehmedî Nijad û mirin bo wî diqîrandin û wêneyê wî ji şewitandin.

Neraziyan bi mehkûm kirina îdama çend Efxaniyan li Îranê de, daxwaz ji hikûmeta Efxanistanê kirin ku vê meselê bi micidî bişopîne.

Hin ji nûnerên Parlemana Efxanistanê dibêjin ku bi dehan kes ji Efxaniyên di Îranê de hatine îdamkirin. Eve jî di halekê de ye ku hêj 2 milyon Efxanî li Îranê de dijîn.

# Hevpeyvîna Rojnameya "Sivîl" Li Gel Birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê



**Li ser çendîn pirsên li rojevê, derheq dawîn guhertinên siyasî ên Îranê çi di warê siyaseta Navikî û çi di warê Tevgera Kesk, mikanîzma berbirû bûn li gel Komara Îslamî a Îranê û gotûbêj li ser pirsa Kurd, me hevdîtinek li gel rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê pêk anî.**

**Raya we li ser nerazîbûnên xelkê Îranê piştî ragihandina encamên hilbijartina Serkomariyê li Îranê de? Di hilbijartinan de we beşdarî nekir, tevlî Tevgera Kesk jî nebûn, lê di wan dawiyane de we bi lez û bez hevsoziya xwe li gel wê pêlê ragihand. sedem?**

Em di roja destpêka wê bizavê de bêalî nebûn, me li ser de jî axiviye. Piştî ku ew tevger pêk hat û xelik rijiyane ser şeqaman û daxwaza dengê xwe kirin, Partiya me jî di hilbijartinan de beşdar nebibû heya ku bibêje "dengê min ka?" lê dema Komara Îslamî bêrehmane kete ser wan neraziyan û kuştin û tepeser kirin û girtin dest pê kir, Partiyê ragihand ku em piştewaniyê ji daxwazên demokratîk ên xelkê dikin û li ser van tepeserî û pêpeskirinan, em Komara Îslamî bi tawanbar dizanîn û mehkûm dikin. Cudahiya helwesta Partiya Demokrat ligel hin ji aliyên din ew bû ku beşek ji wan di wê bawerê de bûn ku madem ew xwenîşandanane berdewamin, êdî Rejîm dê bihiloşe û ger zû xwe neavêjîne nav wê şemendefirê, dê parre bimînin û beşa wan namîne.

Me ew mesele wisan nedidît. Çima? Ji ber ku di gava yekemîn de rêberiya wê bizavê di destê moreyên Komara Îslamî de bû, wan xwe di desthilatdariyê de xwe ceribandine. Kerobî di serdemê Serkomariya Xatemî de ku reformxwaz di kopika desthilatê de bûn, Serokê Perlemanê bû. Mûsewî di serdemê Serkomariya Xamineyî de Serokê Civata Wezîran bû, di dema desthilata wan de, mezintirîn cinayet derheq bi mirovahiyê hatine kirin û deng ji wan nehatiye. Wê carê jî ger ew gihîştiban desthilatê, tu basek li ser wan tawanan nedikirin û tu tesîr û bandorek nedibûn, her wek di derbazbûyî de jî nebûn.

Ji aliyek din ve me bawerî bi wê yekê nine ku di çarçoveya Komara Îslamî de reformek çêbe û çaksaziyek Civakî bihê encamdan. 30 sal e em dibînin ku ewe ser nagire û reformxwaz bixwe di girtîgehan de ne. kuwaye em piştevanê bizava gelên Îranê bûne û dê bibin jî. Lê ewa ku bizavek xwe bi parastina Komara Îslamî û berjewendiyên Wîlayeta Feqîh ve girê bide, em piştgiriyê lê nakin. Her wê demê me ragihand ku eger çêbe dirûşmên wê bizavê di çarçoveya ''dengê min ka'' û ''Komara Îslamî'' derkeve û ji bo guherîna hikûmeta Komara Îslamî be ber bi demokrasiyê ve, em dê têde beşdar bibin û ya ku ji destê me bo bihêzkirina wê bizavê bihê, emê bikin. Ew piroseye ku gav bi gav pêşve çû û di rojên dawiyê de bi taybet di rojên Xwandekar û Aşorayê de ew dirûşmên ku di çarçoveya Komara Îslamî de bûn, kêmreng bûn û her çiqas Mûsewî û Kerobî hawar dikirin ku nabe sînor bihê bezandin û nabe di çarçoveya Komara Îslamî de derbiçin û yan jî dirûşmên dijî Komara Îslamî bidin, lê berevaj, xelkê dirûşmên ''mirin bo Xamineyî'', ''mirin bo Wîlayeta Feqîh'' û ''cudahiya dîn ji siyasetê'' û ''neman bo Komara Îslamî'' ...diqîrandin.

Gelek siroştî ye ku ew dirûşmane xwast û daxwazên me ne jî û em dê tevlî bibin û dema me zanî ku guhertinên wisan têde pêk hatine, emê destek û piştgiriyê bidnê û em xwe tê de dibînin. Vêca bi navê Kesk be yan her navek din, girîng nine.

Ew bêdengiya demkî û matbûna nearamiyan û bizava nerazîbûnê agirê bin xweliyê ye û dê di bûyerên pêşerojê de dîsan serî hildin û radîkaltir dibin û bê guman vê carê dûr ji çarçoveya Komara Îslamî û Yasaya Bingehîn a Îranê û reformxwazên hikûmetê dê vejît û bi bawera me hêza sekolar xurttir dibe.



Lewra me jêweye ku Tevgera Kesk di destpêkê de heta roja Xwandekar û Aşorayê cudahiyek zaf bi ser de hatiye û radîkaltir bûye û wê yekê jî wa kiriye ku Partiya me helwestek cudatir ji ya berê hebe. Niha jî bawera me ew e ku eger Mûsewî û Kerobî rêberiya vê bizavê bikin, seba wê yekê ku ew bixwe mezintirîn asteng li ser riya demokrasiyê ne û tu tiştekê bo xelkê naxwazin. Nihayet de dê bas ji hilbijartin di çarçoveya Yasaya Bingehîn de bikin, yasayek ku çavkaniya hemû bêbextî û bextreşiyan e bo gelên Îranê. Nemaze ger bas ji yasayê jî nehê kirin, heta Welî Feqîh li wir be di wê sîstema girêdayî de çi bi Serkomar tê kirin. Serokkomar bê desthilat e û Welî Feqîh çavkaniya hemû hêz û desthilatekê ye di Komara Îslamî de. Vêca çi Ehmedî Nejad û çi jî Mûsewî Serokkomar be li pirsên sereke û çarenivîszaz çi guhertinek rû nade. Ji aliyek din ve ew kesên ku li serweyî wê bizavê bûn, heya niha jî di qalibê xweyî û ne xweyî de derneçûne. Li ser gelek meseleyên derhest helwest hebûn û guhên xwe jê kerr kirin û wê dawiyê de jî bê deng bûn. Me pêşbînî dikir ku eger rojek bihê ew kesane hest bikin ku metirsiyekê bo Komara Îslamî derdixîne holê û xwastên wan jî nahên bidestxistin, Îzin nadin ku ew bizave li wê çendê pêtir xurt bibe. Her wek me dît ku xelkê di rojên dawiyê de dirûşmên

**Madem ku parastina rejîmê ji bo desthilatdarên Îranê armanca dawîn e, dê her tiştekê di riya wê armancê de gorî bikin**

Komara Îranê diqîrandin û ne tenê berbirûyê Xamineyî û Ehmedî Nejad, belkî hemû sîstemê bibûn. Ew nîgeran dibûn û xelik dûr dixistin û min jêweye ku ew, Komara Îslamî ji her hikûmetek din a ku kar bo cudahiya dîn ji dewletê bike, pê çêtirin. Diyare gelek mesele jî di pişt perde yê bûyeran de hene ku renge pirsgirêkên navbera wan de aram bike. Ku me zaniyariyên hûr li ser wan nine.

Diyare desthilatdarên Komara Îslamî li hember wan kesên ku rewatî û meşrûiyetê bi desthilata wan nadin û kar bo nemana Komara Îslamî dikin, tu nermiyekê nîşan nadin û wek dibînin Kurd û heta kesatiyên wek Ayetolla Birûcêrdî, Şîeyê 12 îmamî ku bawerî bi cudahiya dîn ji siyasetê heye, ketine ber êrîşên dijwar û roj nine hejmarek hukmê girtîgeh ên demdirêj û îdam û gulebaran kirin ji bo wan der neçe. Di halekê de kesên din jî dikevin ber lêborînan û hukmên kêm û azadiyê.

**Siyaseta Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê derheq hiloşîna rejîmê çiye? Gelo partiyê pêwaye ew sîsteme astenge li ser riya azadî û demokrasiyê û hewceyî hiloşînê ye? Mîkanîzmên hiloşandina wê diviya çawan bin?**

Me jê waye ku destpêka piroseya azadî û demokrasiyê, roxana Rejîmê ye. Merc jî nine gava ku Komara Îslamî hiloşiya, ya ku cihê wê digre hetmen demokrat e, lê gavên destpêkê bo demokrasiyê di Îranê de, di vir de destpê dike bi vê maneyê ku bi hebûna Komara Îslamî a Îranê, tu guhertinek ber bi demokrasiyê ve bidest nayê, ezmûna 30 salên derbazbûyî ew rastiya xistiye ber çavên hemû xelkê Îran û Cîhanê. Wê dema ku Partiya me dirûşma hiloşîna Komara Îslamî ragihand, gelek kes û aliyan guman wê yekê hebûn ku dê guhertin bi ser vê sîstemê de bihê û dê reform çê bibin. ''Eve reformxwaz 20 sal in qurbaniyan bo didin" niha bo gelek kesan ew gumane nemaye ku Komara Îslamî çê nabe û eger wê demê gumanek hebû, niha tu gumanek têde nemaye. Lê çawan dê bihiloşe? Eve bi xwasta me nine û pêwîstî bi xebatek bê rawestiyan heye, hewceyî bi yekîtiya hêzan û ezmûna siyasî a rêberên pêşeroja tevgera giştî û seranserî a Îranê heye. Heya ku bikarin rê li ber wê yekê xweş bikin û zemînê ji bo xweş bikin. Çunku pilatformek hevpar tune ye, niha bo vê yekê zûye û di pêşerojê de tê kirin. Ez têra halê xwe xêncî hiloşîna wê rejîmê bo gihîştin bi azadî û demokrasiyê tu rêçareyek din nabînim.

**Partiya me jêwaye ku mesela demokrasiyê û çareseriya pirsgirêkan di riya aştî û diyalogê ve tê çareser kirin. Lê girîng ev e ku diyalogê bi kê û li çi demekê de?**

**Gelo hûn diyalogê li gel Komara Îslamî heta bo çareseriya bendek ji madeyên yasaya bingehîn wek esla 15 ku peywendî bi Kurd û netewên din ve heye red dikin?**

Partiya me tu caran got û bêj red nekiriye, di destpêka damezirandina Komara Îslamî di "şanda nûnerayetiya gelê Kurd"de em xwazyarê diyalogê bûn, piştî wê yekê ku bi encam negihîşt, Partiya me xwast bi tenê got û bêjan bike, wê demê beşek zêde ji hêzên din wek hêzên çep ji me re digotin ''parêzkar û diyalog xwaz ''û dirûşm li dijî me didan, lê em di hewla got û bêjan de bûn, heta piştî bi dawîhatina şerê Îran û Îraqê ku li ser maseyê bi nav got û bêjê rêberê Partiyê, Dr. Qasimlû û hevalên wî şehîd bûn. Hemû Ewane derdixin ku Partiya me jêwaye ku mesela demokrasiyê û çareseriya pirsgirêkan di riya aştî û diyalogê ve tê çareser kirin. Lê girîng ev e ku diyalogê bi kê û li çi demekê de? Di zirûfa niha de Komara Îslamî bi peyva rojnamevanekê tûre û hêrs dibe û li wê yekê nerazî ye ku Kerobî û Mûsewî xwasta siroştî a xwe derheq hilbijartina cihê bawera Komara Îslamî radigehînin, xelik tê kuştin û bêhurmetî bi wan têkirin, di rewşek wiha de got û bêj li gel Komara Îslamî xêncî bêezmûnî û nesiyasîbûnê ne tiştek din e. Eger rojek ji rojan Komara Îslamî bixwaze li ser azadî û demokrasiyê got û bêjan bike, asayî ye ku bihê bersivdan. Lê Komara Îslamî nîşan da ku alîgirê got û bêjan nine û kêmtirîn xwastan ji hevriyên xwe napejirîne, çi bigîje netewa Kurd û daxwazên rewa ên wan ku di çanda wan de cih nine.

**Raya we li ser pirsa navikî ya Îranê çiye?**

Îro ji hemû kesê re eşkere ye ku armanca rejîmê di pîdagirî li ser dirêjîdana piroseya navikî, bidest xistina çeka Etomî ye. Renge yek ji armancên Komara Îslamî bo gihîştin bi wan çekan, parastina rejîma xwe be û wusan bifikire ger ku bibe xwediyê wê çekê, êdî tu hêzeke derekî nekare pêre berbirû be û rejîma wan biroxîne. Madem ku parastina rejîmê ji bo desthilatdarên Îranê armanca dawîn e, dê her tiştekê di riya wê armancê de gorî bikin. Tenê wê demê dê amade bin dest ji wê pirojê bikişînin, yan li beramber xwast û daxwazên navnetewî de teslîm bin ku gefên li ser rejîmê bi kiryar û di piratîk de bigihîjne wê astê ku dirêjîdan bi wê pirojê dibe sedema nemana rejîmê. Lê niha ew gefên gavên piratîkî li ser rejîmê wek cezayên abûrî di wê astê de nebûne û rejîm jî guh nade wan. Gelo di pêşerojê de ew gef û pêngav dê bigîjin wê radeyê? Divêt carê çavnihêr bîn.

**Derbirrîna bêwêne a Demokratan dijî Rejîma Îranê**

# Birînek Çilkgirtî Û Genî Li Cîhanê De

Li gorî radyoya Alman, Serokê zorahiya Senaya Amerîkayê ji Partiya Demokrat, bi lehnek tund û bêwêne, Komara Îslamî weke birînek kêmgirtî di cîhanê de nav bir û got: Me bi qasê hewce çavnihêriya encamên rêkarên dîplomatîk kiriye.

Hirî Rîd, di civîna nûçegihanan de daxwazkarê dorpêçên giran û tund ên abûrî û siyasî li dijî Komara Îslamî a Îranê bû.

Gotinên wê senatora Demokrat di rewşekê de ye ku kongireya Amerîkayê di halê hilgirtina gavek esasî di çarçoveya tehrîm û dorpêçên giran bo ser alav û berhemên niftî bi taybet benzênê bo ser Îranê ne.

civata nûnerên Amerîkayê, di encama dengdanekê de bi 403 dengên **Erê** li hember 11 dengên **Ne**, gihîşte vê encamê ku di çend heftiyên dahatî de, şêvirmendên SENA û Civata Nûneran derheq awayên hisar û tehrîmên dijî rejîmê gelale û pirojeyek hevbeş amade bikin, ku divêt heya 28'ê Gulanê bihê amade kirin.

Hirî Rîd got: Bi amadebûna gelaleya dawîn, derhal dê bixebite ku Li SENATÊ de bide pejirandin.



www.arsivakurd.org

**RONÎ**

**Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re**

**Ebdulla Hicab**



# Piştî Viran Dor Hat Hirran

Kêmasiyên rêjîma Komara Îslamî ne yek û du ne. Bi hindê re jî girêdayî pirsgirêkên gelên Îranê bi wê rêjîmê re cewherî û bingehîn in. Berî her tiştî bingeha sîsetma siyasiye Îranê li ser duçavkî, xap, vir û bê edaletiyê hatiye ava kirin. Ji Yasaya Giştî ya welat re bigre heya pilanên civakî û dan û standinên rojane bi hevwelatiyan re, hemû pîvan û nirxên Komara Îslamî bi yên civaka medenî û pîvanên demokrasiyê re di nava nakokiyan de ne. Lewma çi Mehmûd Ehmedînijad û Elî Xameneyî li ser kar bin çi kes an kesayetiyên din, ne tiştekê ji cewherê dijî demokratîke rêjîmê diguhere û ne jî pirsgirêkên gelên Îranê bi wê rêjîmê re çareser dike.

Di gel naveroka dijî demokratîke sîstema siyasiye deselatdar, piraniya karbidestên Komara Îslamî, bi taybet kesayetiyên ku di serê sêgoşeya deselatê de cîh digrin, bi ne rastî û derevan têne naskirin. Ev yek babeta serekeye netifaqiya di navbera du kandîdayên rikeber di hilbijartina sala çûyî ya serkomariya Îranê de bû. Ber hindê ji nakokiyan bi der, di navbera gelên Îranê û deselatdaran de bêbawerî jî heye. Bi awayekê ku rêjîm her çi bêje an çi karê ku bike, heta eger bi mebestek xirab jî nebe, tu kes baweriyê pê nake. Hema karbidest bi xwe jî baweriyê bi xwe û pilan û gotinên hevbîr û hevkarên xwe nakin.

Weke ku cewherê dijdemokratîke rêjîmê û virên Serokkomar û karbidestên payebilind têrê nekin, niha nîşane derdikevin ku deselatdarên Îranê hirr jî bûne. Projeya atomî, ceribandina roketên nû û di wan rojên dawî de jî manovrek xurt ya serbazî û gefkirin ji Amerîka û Îsraîlê çend mînakên wê hirr bûnê ne.

Li gor nûçeyên malpera fermî ya Sipaha Pasdaran "Sepah News", deryadar Elî Fedewî, piştî manovra deryaî ya hêzên Sipaha Pasdaran gotiye ku "şiyana Sipaha Pasdaran di astekê de ye ku dikare sitûnên hêza Amerîka di heremê de bihejîne". Pasdar Muhemed Elî Ceferî, fermanderê giştiyê Sipahê jî dubare basî hêza xwe ya xurte leşkerî kir. Li pey wî re, karbidestên din yên payebilinde leşkeriye rêjîmê, weke Neqdî, Wehîdî, Fezlî û hwd, yek li pey yê din derketin ser sahnê û basî şiyana xwe ya leşkerî kirin.

Ji gotinên hemû karbidestên din eşkeretir, gotinên pêşnimêjê zêde tundrev yê Meşhedê, Ehmed Îlmulhuda bû ku di xutbeya xwe ya dawî ya nivêja înî de gefa şer li Amerîkayê kir û got; "Îro demara jiyana Amerîkayê di dest hêza me ya leşkerî da ye ji ber ku em dikarin bi kinî 30 binkeyên leşkeriye Amerîka bi roketan bikutin". Di dawiyê de jî Elî Xameneyî di pesna şiyana serbaziye hêzên xwe de îdia kir ku hêzên di bin fermana wî de pir hêsan dikarin li hember Amerîka yê de rawestin.

Sipaha Pasdaran bi hêza xwe di 4 waran de bi bawer e û bê guman di dema netifaqiyek cidî bi Amerîka an Îsraîlê re re dikare her yek ji wan kartan li dij berjewendiyê Amerîka û Îsraîlê bikar bîne;

1) Tora navneteweiye terorê, ku îro rojê li gelek welatên Erebî, Îslamî, Amerîka Latîn û Ewrûpa di tevgerê de ye. Ev torên raçandî niha mijûlî destnîşan kirin û nasîna armancên êrîşên pêşerojê ne û heya niha jî derketiye ku dema bi pêwîst bizanin, ev tor dikevin kar û kesayetî û armancên ku ne bi dilê rêjîma Îslamî bin didin ber êrîşê.

2) Hêz û dezgehên şêveserbaziye Besîc ku bi belemên tundajo û çekên sivik yên êrişber teyarin. Ew hêz ji ber sîstema bi rêkxistinkirina derveyî navendî, dikarin di dema arîşe û aloziyan de, bêy ku ji navendek karîger destûrê bistînin êrişê bikin ser amancên xwe. Mîlîsên Besîc hem ji bo civakê û hem ji bo asayişa navneteweyî gefek cidî ne û ji ber perwerdeya îdeolojîk ya li ser bingeha teror û tundajotiyê hatiye danîn, dikarin bi tehlîke bin.

3) Sipaha Pasdaran hêzek xurt ya abûrî jî di destê xwe de zevt kiriye. Ev hêz di dema pêwîst de dikare weke çek hem li navxwe û hem jî li hember dijberên derke bê bi kar anîn. Eger bê û pirojeyên abûriyê ku Sipah birêve dibe, bên rawestandin, wê demê civak jî dikeve tengasiyek mezin de.

4) Kartek din ku rêjîm dikare di dema arîşên bi aliyek derekî re bi kar bîne, teknolojiya nû ya roketên erd bi erd e ku bi saya ticareta bi Korya Bakûr, Çîn û Rûsyê re bi radeyek zor ketine dest Komara Îslamî. Ev yek di warê leşerî de dikare bibe faktorek bi bandor.

Lê dema kar gîha hisaba dawî, ne tu yek ji wan kartan û ne jî çi emrazek din dikare rêjîmê li hember artêşên xurte Amerîka û Îsraîlê de biparêze. Her yek ji wan hêzan, xwediyê teknolojiyek xurte serbazî û bingehek bi hêze abûrî ne. Ji wê yekê jî hê giringtir piştgiriya navneteweiye wan hêzan û sîstemên wan yên siyasî ne ku bi awayek xurt ji aliyê gelên xwe ve têne parastin. Demokrasiya lîberal li her yek li wan welatan bi awayekê cîh girtiye ku gelên wan welatan berjewendiyên xwe, welat û dewletê bi hev re girêdayî dibînin, lê Îrana Ehmedînijad û Xameneyî, ji dijberên dereke pitir dijberên navxweyî hene.

Heya niha hêza ku sîstemên siyasî diparêze, piştgiriya gelan û jiyana di nava tenahî bi cîran û cîhanê re bûye, neku hêza leşkerî an xurtbûn di warê teknolojiyê de. Dema Hîtler şerê cîhaniyê duyê dest pêkir, hêza wî ya serbazî di astekê de bû ku di heman demê de ji çar aliyan ve êrişî cîranên xwe kir.

Di çend rojên destpêka şer de hemû welat û deverên ku ji xwe re bi armanc girtibûn, dagîr kirin û weke mezinhêza herî xurte cîhanê kete rojevê. Di hundirî Alman de jî Hîtler piştgirî hebû. Lê govenda wî li gor saza cîhanê nebû û di dawiyê de serubin kete nava kurr û çilkava siyaseta xwe de û Alamn jî xiste bin barê berpirsayetiyek giran ya dîrokî de.

Sîstema Sovyetê jî nekarî bi hêza leşkerî û bi îdeolojiya tundajo xwe biparêze. Piştî dehan sal deselata bi darê zorê, ji nişkî ve, bahoza kîna gelan hat û di nava çend saetan de hemû hêz û şiyana Sovyetê bê karîgerî kir.

Ehmedînijad, Xameneyî û heval û hevpeymanên wan ne bi îdeolojiya xwe, ne bi çek û îmkanên leşkerî û ne jî bi torên kuştin û tirsandinê dikarin bigehin wê astê ku Almana Hîtler an sîstema Sovyetê gîhabûnê. Lê qedera wan sîsteman li ber çav e.

Dibêjin "rovî" li ber tava ser êvarê temaşey siya xwe kir û ji ber ku siya kêleka wî ji kelûşê wî mezintir bû, wisan hesiband ku bûye "şêr" û hema derhal êrişî "hirçê" kir. Rêberên Komara Îslamî jî ev demeke ku mendehoşiyê hêz û şiyana xwe ya leşkerî bûne û diyare şaxên wan li qoçanêyek nû re dixure. Kurt û kurmancî, ew bi yekcarî hirr bûne û wê dereng an zû serê xwe bixin belayekê, lê hêvî ew e ku ew bela ji gelên Îranê bi dûr be û bi tenê şerûd û şerxwazan bixe nav telikê.

www.arsivakurd.org

**Kilînton:**

## Gotinên Ehmedînijad dubare û bê bingeh in




Wezîra Karê Derve ya DYA'ê Hîllary Kilînton, li hemberî gotinên Sorokomarê Îranê Mehmûd Ehmedînejad helwest nîşan da û diyar kir ku axaftinên wî dubare û bê bingeh in.

Li konferansa pêşgîrî ji xurtbûna çekên navikî (NPT) ku roja Duşemî li NY de birêve çû, Ehmedînijad dîsan bêserûber axivî û bi tundî êrîşî DYA û welatên Ewropayî kir û ew bi binpêkirina yasayên navdewletî tawanbar kir. Lê ew ji hêla Sekreterê Giştî yê NY'ê Ban Ki Moon û Sekreterê Ajansa Navdewletî ya Enerjiya Nukleerî Yukiya Amano bi tundî hat rexne kirin û civîn jî ji hêla wan û şandên DYA'ê, Fransa û Brîtanyayê di dema axaftina Ehmedînejad dehat bi cih hiştin. Paşan Wezîra Karê Derve ya DYA'ê Hillary Kilîntonê, gotinên Ehmedînejad bi dubare û bêbingeh da zanîn û diyar kir ku tu tişket nû di axaftinên wî de nebûn.

Hêjayî gotinê ye ku Ban Kî Moon di avatina xwe de bi eşkere rexne ji Îranê girt û daxwaz ji rejîma Îranê kir ku pabend bi biryarnameyên Şêwra Ewlekar be û divêt hemû nigeranî û gumanên li ser bernameya navikî ya xwe jinav bibe.

## Erdoxan Îsmet Înono Bi Hîtler Şiband!




Li Meclîsa Tirkiye hewildan û şerên di navbeyna hikûmeta AKPê û mixalefetê li ser paketa guhertina destûrê bi tundî berdewam in. Vê carê Hîtler bû mijara şerê wan û li vê derheqê de Erdogan got:

Denîz Baykal axiftinek kiriye û bi vê yekê em wek Hîtler û xwe jî wek Çirçîl daye nimûnekirin. Lewma ger ew dixwezin Hîtlerê rastîn nas bikin, bila zehmet nebe, di salona avahiya partiya xwe ya merkezî de li dîwarê binihêrin û ew dê wêneyekî bibînin. Wêneyê serokê xwe yê ewil, (Îsmet Înon) ku heta serî û simêlê xwe jî mîna Hîtlerî çêkiriye û di bin simêlê xwe yê Hîtlerî pîs pîs kenokiya xwe diyar dike bike.

Bi vê çendê ji Erdogan bi zanebûn yan jî bê zanebun rastiyeke mezin dest nîşan kir, lê du kêmasî di vê tesbîta wî de hebûn.

1. Eger Înonû Hîtler be, ancax ew jî bi awayek din Hîtler e. Jiber ku îdeolojiya Mustefa Kemal ji layê Înonû hate cîbecîhkirin.

2. Eger Hîtler hebe Yahûdiyên wê jî hene ku ew jî gelê Kurd e û Amed, Dara Hênê, Geliyê Zîlan, Agirî, Dêrsim û Sêwasê wek Yahudiyan rastê jenosîda Mustefa Kemal û Înonû hatibûn.

**http://www.kurdistan-news.net/**

*Rojev*

# Turkiya, Reformên Destûrî Û Kurd

**Selîm Zencîrî**

Yasaya Bingehîn a Turkiyê ku li 12'ê Îlona 1980'ê bi zora hêzên statûkparêz û jeneralên şovenîst yên Turkiyê ve hat sepandin û heya niha jî kar pê tê kirin, bûye bi kusp û astenga sereke li hember pêşketin û geşekirin demokrasiyê li Turkiyê de. Yasayek ku bi çavkaniya hemû şer, bêbextî, kavilkarî, qorbanîdan û tund û tûjiyekê tê zanîn. Yasayek ku tejî ye ji needaletî û ferq û cudahiyan û bi vî şekl û cewhera xwe ya nedemokratîk, ne tenê tu pirsgirêkan çareser nake, belkî bi derbasbûna demê zêdetir jî dike. Lê niha derfetek çêbûye ku Partiya desthilatdar a AKP'ê li bin zext û givaşên Yekêtiya Ewropayê de heya qasekê Destûra Bingehîn biguherîne. Herçend ku ew reforma nisbî jî bi gelek êş û jan û astengan ber bi rû ye û berxwedana hêzên tarî û statûkparêz li hemberî van reform û rêlibervekirinê de berdewame jî û reng ew reformane bi dilê me kurdan jî nebin û hemû xwest û armancên me jî li xwe de cih nedabin, lê her çawa be ji ya berê baştir dibe û divêt kurd ji bo guhertina her xal û madeyek ji vê Destûrê ku hêviyek têde bixuye, destekê bidin vê guhertinê.

Her çiqas ku li nav paketa AKP' û hikûmeta Turkiyê de reform hemû yasayê nagre û ew 3 madeyên ku bingeh û stûna Komara Turkiyê pêk tînin, destê kurdan jî digre û înkar û îmhaya gelên ne turk û bi taybetî gelê kurd li Turkiyê de jî dike, dê wekî xwe bimînin û derbas bûn ji wan, hêla sor û bive ye. Lê her guhertinek li ve yasayê de dê destkevtên xwe jî hebin. Çunku şikandina vê taboyê ji aliyê AKP'ê ve li cihê xwe de destkevtek mezin e. Ev AKP a ku bûye bi belaya serê CHP û MHP'ê dewleta kûr a bi navê Ergenekonê.

Me dîtku çend roj bûn Parlementoya Turkiyê, nirxandina yekemîn ji reşnivîsa Destûra bingehîn dikir ku çendîn madeyên giring li xwede cih dabûn. weke yasaya daxistina Partiyên Siyasî, Dadgeha Destûrî, Dadgeha leşkirî û çendîn madeyên din ku girêdayî bi mafên medenî û civakî ne û ...ku li qonaxa yekemîn de bi dengê zorahiya Parlemanê (AKP)'ê hatin pesend kirin û ger dengê hewce yê Lê vê navberê bidest nexistiba, dê ketiba ber referandomê. de her du Partiyên Komarîxwaz û netewperest bi tundî dijberiya wan reforman kirine û bona asteng kirin û tevliheviyê, ya ku ji destê wan hatibe, encam dane. Bi taybet Serokê CHP'ê ragihand Eva kûdetayek sivîl e û reformên han ruha destûrê diguherînin û Erdoxan dixwaze bîr û hizr û zêhniyeta xwe bi ser destûrê de bisepîne. "Bîr û hizrek ku dibe bingeha parçebûna Turkiyê". Ji hêla din ve jî Perlemntera ser bi BDP'ê, Sebahet Tuncel bi axaftina xwe perleman hejand û li ser gotina Serokê Parlemanê ku gotibû "li wî welatî de şer tune, lê şerê dijî terorê heye", Tuncel hêrs bû û da zanîn" ger ku şer nine, çawan 40 hezar kes mirine? Çima ewqas bûtce ji bo şer tê terxan kirin û ..., û li dawiyê de got ez şerm dikim li Parlementoyekê de diaxivim ku agirê şer xweş dike". Derheq reformên destûrî de mixabin BDP, take partiya nûnerê kurdan li Parlementoyê de li hêla siyaseta CHP û MHP'ê de gav avêt. Bi taybetî li ser madeya 8'ê a Yasaya Bingehîn ku Turkiye kiriye bi goristana Partiyên Siyasî û BDP bi xwe jî li encama daxistina DKP li gorî wê madeyê hat avakirin û diviya BDP beşdariyek çalakane bo guhertina vê yasayê bikiriba ku mixabin nekirin. Çunku ew li ser vê baweriyê ne ku AkP dixwaze rûyê xirab û pasîv yê destûrê nû bike û bi rûçikek din bi xelkê Turkiyayê bide qebûl kirin, lewre li gel wê de ne ku reform dest bawêje hîmê kemalîzmê û dewleta netewî a yekpar û dixwazin ku guherîn hemû Yasayê û bigre yasayek sivîl û tam demokratîk cihgîr bibe ku eva jî li gor nirxandina rewşa Turkiyê û zêhniyeta mewcûd a kemalîstî carê mumkin nine. Lê eva jî raste ku Erdoxan xincî berteng kirina qadê ji partiyên tunajo û kemalîst re, dixwaze bi wan kême reforman, qenaetê bi kurdan û YE'ê bîne ku dixwaze demokrasiyê pêşve bibe û Ji aliyê din ve jî dixwaze pêgeha xwe bo hilbijartinên sala 2011'an bihêz bike Lê dîsan jî bi bawera min BDP şaşîtî kir û divêt serbarê piştgirî kirinê, AKP bo reformên zêdetir hay bide.

Lê kurdan li cihek din de ew şaşiya xwe serrast kirin, ew jî ew hêviya ku niha afirandine û ew partiyên ku li qada eşkere li turkiyê de xebatê dikin, li pilatformek hevbeş û demokratîk de li dora hev civiyane û dixwazin bereyek netewî pêk bînin. Eva jî li cihê xwe de gavek girîng û dîrokî ye û dibe sedema yekbûna mala kurdan, ku ew jî dikare li hevkêşeyên siyasî de gelek tiştan biguherîne. Bi taybetî ku li hilbijartinên dahatî de dikarin baraja %10 'ê derbas bikin û serkevtinên baş û zêdeyî 40 nûneran bişînin Parlementoyê, ku wê demê dibin bi girûpek bihêz li Perlemanê de û misoger kirina destkevtan jî hêsantir dikin. Lewre divêt ji her aliyekê ve destek û piştgirî ji vê gava dîrokî û stratejîk bihê kirin û ew valahiya ku mêjdem e li nav tevgera rizgarîxwaziya gelê kurd li Kurdistana Bakûr de xûya û berçav bû û zêdetirîn sû îstefade lê hatibû kirin, tejî bikin.

# 31'Mîn Salvegera Hêza TepeserKar A Spaha Pasdaran



Nûredîn Sofîzade

Sipaha Pasdaran, wek hêzek Îdeolojîk, piştî hatine serkara Rejîma Komara Îslamî li 2'ê Banamera 1358'ê Rojî de hat avakirin û pêrewên Xumênî û Wilayeta Feqîh ku di avakirina Sipaha Pasdaran de rol lîstin çend dişopandin sereke bûye, ku emê bi kurtî Îşare pê bikin.

Sipaha Pasdaran bi tewayî fermanberê Wilayeta Feqîh û rejîma teze bi desthilat gihîştî be li hember her gefeke li dijî nîzamê.

Bo tepeserî û jinavbirina her dengek azadîxwazane û dijberî Komara Îslamî Sipaha Pasdaran hêzek be ku pêtir ji Ertêşê derkeve meydanê û bikeve ber çav Çunku Xumênî û darûdestên wî ji hebûna ertêşek serbixwe nîgeran û ji egera birêve nebirina fermana Wilayeta Feqîh, bi taybetî kûdtayan tirs hebûn. Çunku ew hêz di serdemê paşatiyê de heya Qasekê sekolar û laîk bû û gelek girêdayî bi dîn nebû. Her ji ber wê yekê bû ku bi tometên cur bi cur û bê sebeb fermander ên Ertêşê dihatin tîrbaran kirin.

Lewma me dît dema ku şerê Îran û Îraqê dest pêkir, rejîmê dirêjî da wî şerî û gotina Xumênî ku "şer neimeta lahî ye", armancên taybet bi xwe hebûn ku basek zûde hildigre.

Rejîmê, Ertêş bi şer tevî Îraqê ve mijûl kir û bi destê Sipaha Pasdaran jî tepeseriya navxweyî destpê kir, bi taybetî tepeseriya neyaran û netewên azadîxwaz ên Îranê.

Piştî 8 salan û ragirtina şer, rolê Sipahê hat guhertin û hêdî hêdî di qalibê "cehad sazendigî" kete nav pirojeyên binav avedaniyê û stûnên xwe bi sermiyadanên mezîn qahîm kirin. Wê demê bû ku me dît piraniya fermander ên Sipahê ku xincî girtin, kuştin û cinayetan çi tiştek din nedizanîn, wek mihendisên avedaniyê bûne şaredar, parêzgar, û ketin îdaran û dest bi pirojên mezin kirin.

Qonaxek din li jiyana Sipahê piştî wê bû gava ku rejîmê li şerê Îran û Îraqê de seh bi kêmasiyên alavên leşkerî yên xwe kiribû û tenê bi hêza milên xelkê bêberevan şer kir. Lewma sipah wek hêzek cihê hitbarê, kete nava berhemanîna çek, Çeberxane û teknolojiya şer. Dest bi ser avedaniya welat û him jî nepenî, çek û cebirxanên rejîmê de girt û heta qasekê Ertêş kêmreng û çav ji destê xwe kir.



Qonaxek din li jiyana Sipahê, ewe bû ku sîstema Wîlayeta Feqîh bo û padaşdana xizmetên Sipahê bi rejîmê weke parêzvanê îdeolojîka kevnarperwerane, hêdî hêdî endam û karbidestên Sipahê tevlî siyasetê kirin û hejmarek kirin bi dîplomat, sefîr, fermandar, şaredar, parêzgar, nûnerên perlemanê, wezîr û heta Serokkomariyê, ku niha em dibînin Ehmedînejad û kabîna xwe bi piranî Pasdar in. Hin ji Pasdarên mirovkuj heta medrekên xwandinê jî tunebûn bi çêkirina medrekên tezwîr (ceilî) gihîştine kopika desthilatê. medrekên tezwîr yên pêtir ji 10 kes ji wezîrê Pasdar di kabîna 9'ê ya Ehmedînejad de bo Rejîmê ku serêşiyek mezin çêkir, mînaka herî zindîye Bi liberçav girtina qonaxên ku Sipahê derbaz kirine û di her qonaxekê de pileyek hilkişiya ye û hêza xwe xurt kiriye, dibînin ku niha jî di Îranê de rolê birêvebirinê di her warekê de heye. Bazirganiyên mezin ên "waridat" û "sadiratê" anku derfirotin di destê Sipahê de ne. Hêza bi qaweta eskerî wek gefeke mezin, ne tenê bo tepeseriyê navxwe yî, belkî bo derveyî welat jî tê bikaranîn. Midehekê berî niha jî Sipahê ji bo qorixkirina tewayî a welat, dest da kirîna çiqên mezin ên wek "mixabirat", ne tenê bo qazancê ticarî, belkî bi mebesta kuntirolkirinên casûsî û..., herweha ji bo perwerde kirina tirorîstan û şandina wan bo welatên din ji bo maytêkirin di kar û barên deverê de.

Meseleyek din pirsa Navikî a rejîmê ye ku serperestiya wê di dest Sipahê de ye. Di wê derê de ye ku tê xuyakirin, Amerîka û hin ji welatên Ewropayê, bi hegera piştevanî kirina Sipahê ji bernamên Etomî û desttêwerdan di karûbarên welatan bi taybetî Îraq û Efxanistanê, desipah xist nava lîsta saziyên terorîstî û tehrîm bi ser de sepandin.

Desttêwedanên Sipaha Pasdaran di operasyona "polşûyî" a di riya yek ji wezîrên welatê Behrînê, sûçê herî teze yê Sipahê tê zanîn ku bûye seba li ser kar derxistina wî wezîrî.

Qirargehên Sipaha Pasdaran ku bi bigehên terorîstî hatine naskirin, riyek din a mifah sitandinên nerewa ên rejîmê ye. Qirargeha Xatem Embiya yek ji wan bigehan bû ku ji aliyê Amerîka, Firansa Birîtanya, Almanya yê, seba pirojên casûsî û terorîstî hatiye Dorpêçkirin. Sipaha Quds ya ser bi Sipaha Pasdaran ku bê rawestan dixebite, bingehek din a fesadê ye ku ew jî çiqek terorîstî ye.

Sipaha Pasdaran eger çi îro rojê tewayî warên siyasî û ticarî ên welat girtine destê xwe, lê qet ji tepeseriya xelkê Îranê bêhay nebûye. Di sala derbazbûyî de piştî nerazîbûna xelkê welat li hember encama maşkanê ya hilbijartina Serokkomariyê, sipah bêrehmane hate meydanê û ya ku ji destê wê hat, ji bo matkirin û tepeserkirina dengê xelkê nerazî yê Îranê, endamda.

# Îran Îdz Û Madeyên Hişber Dişîne Welatên Cîran

Rojname ya "Şerqul Ewset" a çapa Londonê, di nûçeyekê de da zanîn ku karbidesteke bilind ê Behrînê, Îran bi wê yekê tawanbar kir ku ew welat rasterast rêxweşkerê belavkirina mad ên hişber li Riyaz û Menanê ye.

Berpirsê saziya berevanî û pêşgirî ji made yên hişber li welatê Erebistanê, di çarçova civîna 27 welatan de ku Îran jî têde beşdar bû ragihand: Îran rê ji ber qaçaxçiyan xweş dike ku bi karvanên made yên hişber di Îranê de berbaz bibin. Di rûniştina dawîn ya wê civînê de ku bo ji hev nizîkbûn bi armanca hewildan bo pêşgirî ji belav bûna made yên hişber pêk hatibû, berpirsek payebilind yê Behrînê got ku vekolînên me ên ewlehî eşkere dikin ku karbidestên payebilind ên Îranê di şandina made ên hişber de dest hene. Hevdem li gel nerazîbûna welatên cîran li hember Îranê, rojnameya Ehlî a Hevwelatî di reportajekê de amaje bi zêdebûna hejmara kesên tûşbûyî bi Îdzê li başûra Kurdistanê kir û di hevpeyvînekê de li gel .Dr. Lêzan Herdî, cîranetiya welatê Îranê bi sedema sereke ya belavbûna Îdzê da zanîn.



# Kasibkarên Ku Rojê Sed Car Dimrin Û Dijîn



**Ceifer Mubeşirniya**

Hejarî û nedarî li Kurdistana Îranê di astekê de ye ku xelik bo dabînkirina debara jiyana xwe, bi neçarî riyên pir metirsîdar bigrin ber xwe. Xincî jidest dana asayiş, guzeran û tama jiyana rojane ya xwe bo bidest xistina pariyek nan, gelek caran canê xwe jî dikin gorî wî nanî û cesedên bê can ên xurtên kurd vedigerin hembêzên dayîkan.

Lênihêrînek rojane bi ragihandinên Kurdistana Îranê bi taybetî ragihandinên part û saziyên dijberî Komara Îslamî, derdikeve ku kuştin, birîndarkirin û girtina ciwanên kurd li ser sînorên Kurdistana Îran, Îraq û Turkiyê bi destên mirovkujên rejîma Komara Îslam a Îranê, bêşik diyariyên rojane in bo malbatan. Bi tawana wê ku dixwazin bijîn û keda destê xwe bi serbilindî bixon, nek bi nanê îxanetê bijîn û bêdeng bin. Anku di nebûna kargeh û fabrîkayên senetî û çavkaniyên dahatê li encama siyasetên qirêj, bi ferq û cudahî, mîlîtarîstane û dij bi Kurdistanê yên rejîma Komara Îslamî de, xelik bi neçarî rû ji wî karî dikin.

Li kesê veşartî nine ku bezandina sînoran bi awayek neyasayî tawan e, lê di demekê de ku îmkanatên jiyanê û asayişa xelkê ji wan re hatibe dabîn kirin. Lê sînorên ku ciwanên kurd li kurdistana Îranê ji ber hejarî, bêdahatî û belengaziyê dibezînin, çi tawanek heye? Lê bi dûr ji meseleyên siyasî û netewî, em di warê mirovahiyê de jî ger jê bifikirin, girngtirîn sînor, sînora mirovahiyê ye ku eger bêrêzî pê bihê kirin û hat bezandin, êdî maneya jiyanê tune ye, vêca çi sînorên bi kom ên civakê bin çi jî sînorên takekesî.

Eger hat û çûna ser sînor li Îranê ji bo dahatek kêm ya jiyanê weke tawan û bezandina sînor bihê zanîn, başe yên ku ew bi kiryarên dûr ji mirovahiyê yên xwe di wê rewşê de hiştine, divêt bi çi navî bihên pênase kirin. Eger tenê bo yekcar jî be bila nûneratiyek ji saziyên parêzerên mafên mirovan li gel karvanek kasibkarên sersînor de be û bizanibe ku xêncî metirsiya kuştin, girtin, birîndarbûn û zirarên malî, nirxandina qazancên ku bidest dixin bikin, dê wê demê ji wan re eyan bibe ku ev karê han ji bilî neçariyê ne tiştek din e. Ciwanên ku ji bo bidest xistina bijîva jiyana xwe roj sed car dimrin û zindê dibin û herdem li benda kuştina bi neheqî a xwe de ne.

Hêz û çekdarên rejîmê wê kar û kasibiya neçarî a xelkê hejare kurd bi qaçaxçîtî didin zanîn û bi navê parastina ewlehiya welat, morek yasayî didin riftarên nemirovane ên xwe û bê xalûxerez sîngê ciwanên kurd bi nîşangeya gulleyên xwe digrin. Ma karbidest û rayedarên xwînmij ên rejîma hov û dijî mirovahiyê nizanin ku qaçaxçî kê ye û made û alavên qaçax çi ne? Ma her ew ninin ku bi ser keleşên genî û made û alavên qedexekirî di asta hemû cîhanê de diçêrin? Ma her ew ninin ku ba pare û samana wî xelkê bûne bi bandên mafiya û tenahî û asayişa cîhanê jî têk dane û dixwazin bi kuştina ciwanên bêguneh yên kurd li ser sînoran karnameya reş a xwe di qaçaxçîtî û cinayet û hovîtiyê de paqij bikin? Lê divêt bizanibin ku ew tim rûreşên dîrokê û erd û esmanan in û ciwanên kasibkar jî rûsorên gel û nîştiman.



Lê xortên Kurd li Kurdistana Îranê de, serbilindiyê di jiyana metirsîdar û bi neçarî de dibînin. Ew serbilindiyê tenê di zindîmanê de nabînin, belkî gelek caran serbilindiya xwe di gorîkirina canê xwe de dibînin. Li gel wê yekê ciwanên kasibkar ên Kurd di hizr û nêrînên xwe de pare nemane, belkî baş dizanin ku di çi dewranekê de dijîn û fam dikin ku niha mirov hêja û şayîsteyî çi jiyanekê ye û tiştek nine ku di şiyanên wan de nebe. Lê eva dujmin e ku tu riyek jiyanê ji wan re nehiştine û bi her awayekê li hizra tune kirin û nehiştina wan de ye. Anku kuştin û jinav birinek bi bername û sîstimatîk, lê bi şêwe û metodên cur bi cur, yekê bi tometa – qaçaxçîtî- û yê din bi tawana hewlidan bo têkdana ewlehiya welat, yekî din bi tawana propaganda dijî rejîmê, yekî din bi tawana bêhurmetî bi îmam Xomênî û yekî din jî ji ber kasibkarî û jiyanê. Lewma kuştiyên wê riyê jî dibin şehîdên doza gel.

# Diyarbekirê Jinên Her Çar Perçeyên Kurdistanê Li Hev Civandin

Roja 25'ê Nîsana 2010'an, Konferansa Jinên Kurd, ya ku ji aliyê Tevgera Jinên Azad ên Kurd ve li Amedê hatî organîzekirin, bi beşdarbûna gelek parlementer, Serokşaredar, Siyasetvan û jinên rewşenbîr ji parçeyên din yên Kurdistanê beşdar bûne, li Salona resepsiyona Sumerparkê destpêkir. Hevseroka BDP'ê Gultan Kişanak, Parlamnterên BDP'ê yên jin, Siyasetvana kurd Leyla Zana, Ji Kurdistana Îranê Nahîd Husênî (helbestvan û endama Komîteya Navendî a PDK Îranê), ji PDK'ê Şîrîn Amêdî û Emîne Zikrî, ji Goranê Kwêstan Muhemed Abdulla, ji YNK'ê Emel Cemal, ji Parlamentoya Îraqê Ala Talebanî û Parlamentera Ewropa ya berê Feleknaz Uca û ... amade bûn.

Konferansê ji aliyê Siyasetmedara Kurd, Leyla Zana ve hat vekirn û û li ser giringiya vê konferansê axivî û got: girînyeke vê konferansê ew e ku jinên dîasporayê û yên li Kurdistanê cara ewil e tên cem hev. Lewma ev konferans hem ji bo jinan teybet e û û hem jî wek rojekî dîrokî ye, ev cejna ronêsansa jinên kurd e



Herweha got: Pirsgirêka herî mezin ya jinan, azadî ye. Û banga yekitiyê li Kurdan kir û got, "Jinên Kurd, li aliyek bo nasnameya xwe ya jinî, li aliyê dîtir jî bo nasnameya xwe ya neteweyî têkoşiyan." Bi fikrên xwe, çalakî û meşên xwe her tim bo bidestxistina her du nasnameyan hewl dan. Bi vê awayê jina Kurd bû deng û rengê bindest û bêdengan."

Zana li ser pirsgirêkên jinên kurd jî rawestiya û got: " Sedemê vê konferansê ne tenê neheqiyên ku li jina dibin e. Herwisa ricm, suneta jinan, kuştinên ji bo namûsê, şideta di nava malbatê de, berdêl, zewaca bi zorê, tundiya cinsî, tacîz, destdirêjî û qedexeya zimanê zikmakî jî hîn wek pirsgirên jinan dom dikin.

Zana got em dizanin ku ev pirsgirêk îro zû bi zû çareser nabe, lê bi karekî hevbeş û hevkariyan dikare tesîra kêmkirinê çêbike.

Zana herweha bal kişande ser Peymana Qesrî Şîrîn ku Kurdistan parçekiriye û Peymana Lozanê ku Kurd tune hesibandiye. Zana got, tiştên ku Kurd dijîn barê van her du peymanan e û domand, "Ev bar siyasî, civakî, kulturî, olî û aborî ye

Konferansê bi du roj karên berdewam û bi nîqaşên liser mijara `pirsgirêkên civakî û siyasî yên Kurd, redkirin û înkar kirina nasnameya netewî û polîtîkayên dewletê` berdewam serkevtiyane dawî bi karê xwe anî.

www.arsivakurd.org

## Îran bûye Endamê Komîsyona jinan a NY



Komîsyona jinan a NY, yek ji komîteyên lawekî yên şêvra Abûrî-Civakî ya NY ye ku ji 45 endaman pêk tê. Endamên wê komîsyonê her çar sal carek tên hilbijartin. 11 kursî yên wê komîsyonê taybet bi Panaxa Asyayê ne. Endambûna Komara Îslamî a Îranê jî di wê saziyê de di encama wê yekê de bû ku tu welatek din xwe bernijar nekiribû û diviya hetmen welatek bihatiba hilbijartin. Di encam de bi bê tu dengdan û rikeberiyekê Îran bûye endamê wê Komîsyonê. Hêjayî gotinê ye ku ew saziya han, tenê hersal carekê lêkolînê li ser rewşa jinan di cîhanê de dike. Bêyî wê çendê ku kêrhatî û desthilatek taybet hebe. Pêştir Komara Îslamî a Îranê berbijêrê Şêvra Mafê Mirovan bû, lê jiber wê ku di bidestxistina dengên pêwîst de bêşian mabû, xwe ji wê berbijêriyê vekişand û nebûna tu berbijêrek Asyayî bo endametî di Komîsyona jinan de bi derfet zanî û aqibet jî hat wergirtin, lê kanadayê demildest nerazîbûna xwe li hember endametiya Komara Îslamî nîşan da.

## Roja Kedkaran Li Îranê Bû Qada Nerazîbûn Dijî Hikûmetê



Karkerên Îranê bi piştgiriya qatên cuda ên xelkê, merasîma roja 1'ê Gulanê li bajarê Tehranê û bajarên din ên Îranê lidarxistin. Ew roje li Îranê bêhnvedana fermî nine û rejîmê bo yekemîn car îzna xwenîşandanê bi "Mala Kedkaran" ku saziyek ser bi hikûmetê ye, neda.

Tirsa rejîmê ji bûyerên yek sala derbasbûyî û zêdebûna meşên nerazîbûnê ên giştî ye û ew yek jî bi eşkere dixuye. Tevî pêşgiriyên hêzên rejîmê ji her cure nerazîbûnekê ser şeqaman, lê Kedêkaran li hember wezareta kar civînên nerazîbûnê pêkanîn.

Xwandekaran di zanîngehan de piştgirî ji wan kirin û roja Kedkaran bi dirûşmên"azadî, edalet, eve dirûşma milet" lidarxistin. Li gorî çalakên mafê mirov di wê meşa nerazîbûnê de, hejmarek ji xelkê hatine destbiserkirin û bi cihên nediya hatine şandin.

## Tecawiza Hêzên "Îmam Zeman" Bi Keçan Ji Ber Hicaba Nebaş!!




Li gorî Çavkaniyek li bajarê Tehranê, keçek ciwan piştî rewandina wê ji aliyê 3 memûrên besîc ser bi Sipaha Pasdaran ve li Bakûrê Rojavaya Tehranê destdirêjî pê hatiye kirin. Keça ciwan dibêje: Roja Pêncşemî dema ez li cihê karê xwe vedigeriyam malê û li benda taksiyê sekinîbûm, ji nişkîve tirombêlek ku 3 kes têde bûn, li pêşiya min rawestiya. Her sê kes besîcî, û bêsîm bi wan re hebû. Piştre bi wê hêcetê ku hicaba min nebaş e gotin ku dibe ez li gel wan biçim bo binkeya Besîc. Ez ji tirsan siwarî tirumbêla wan bûm.

Piştî demekê ji riya eslî derçûn û ez birim cihek dûr û heya 8 demjimêran tecawiz bi min kirin.

# Bêhicabî Û Erdhej

**Kewê zer**

Di cîhana îro de her cihekê kû ji mirovahiyê re nirxek hebe, kar dike ku jin jî wek mêran bigîjin mafê siroştî ên xwe, lê bi bawer dîtina hin mirovan, siroşt wî mafî nade jinan û azadiya jinan dibe sedema tûrebûn û nearamiya siroştê.

Vedîtin û keşfek nû bêy vekolîn û xwandin û zanistê ku pêtir dişibe "wehyek"ê, di wê cîhana pan û berîn de, bûye nisîbê kesek bê nav û nîşan, ku di du heftiyên derbazbûyî de navdengê mezintirîn û bihêztirîn zana û karnasê warê bûyerên siroştî bi taybet erdhejnasiyê bidestxist. Ew jî bi hinek hizrîn û çalakkirina zêde ya mêjiyê xwe ew rekord bi navê xwe tomar kir.

Piştî biencam negihîştina koma karnasiya bûyerên siroştî li ser sedemên Erdhejê, Hocetull Îslam Kazim Sidîqî Pêşnimêjê demî yê bajarê Tehranê bi îlma xwe ew yek îsbat kir û ragihand ku sedemên erdhejê di bêhicabiya jinan de ye. Ew zanista nû, karnasên erdhejê heyirandin û zehmetên wan ên çendîn sal di avê de berdan.

Pêşnimêj Kazim Sidîqî ku di bawera hin kesan de mamostayê exlaq e, gilî û gazindên xwe dike û dibêje: Gunehên biçûk di civakê de zêde bûne û dubare kirina wan jî, gunehan mezintir dike û dibe sedema xurtbûna zinayê di civakê de, û bi vê çendê jî erdhej zêde dibin. Keşfa wî mamostayê Ayînî di encama egera rûdana erdhejê li bajarê Tehranê de ye ku wê dawiyê de Ehmedî Nejad hişdarî di wî warî de dabû. Hewlên wan ew in ku rewan û heşên xelkê mijûl bikin yan jî hejmarek ji xelkê akincî li wî bajarî derxin.

Kazim Sidîqî li ser giranî û hişkesaliyê jî dibêje: sedema sereke ya zulm û siteman di emantê de ye, herweha derketin ji riya dad û edlê dibe sedem ku barana rehmetê nebare. "Ji bo wê yekê jî hemû cinayet û hovîtiyên xwe û hevbîrên xwe jibîr bike û erîşê bike ser jinan û dibêje: gelek jin bi dirostî kincan ji xwe nakin û mêran ji rê derdixînin û zinayê di civakê de xurt dikin, ku eva jî dibe sedema sereke a erdhejê!!!.

Ji aliyek din ve Ayetulla Cenetî jî raya xwe eşkere kir û got: "hewce ye bi şev û roj em zikr û îbadetê bikin ku erdhej rû nede". Eve jî di demekê de ye ku mêj dem e mirov gihîştiye wê encamê ku siroşt karê xwe dike, lê ewe mirov in ku divêt ji xwe re çareyek bibînin.

Seba wê gotina dîrokî a Kazim Sidîqî, dijkiryarên cudali nav jinan de çêbûn. Gelek ji wan jinan ragihandin ku emê xwe rût bikin daka bizanin erdhej dê rû bide yan na? Her seba wan gotinên xurafî û şaş ên Sidîqî, kempînek berfireh hatiye li darxistin ku sedanhezar jin ji hev civandine û dixwazain bi bê hicabiya xwe bizanin ka gelo erdhej dê rû bide yan na? û bi wê çendê jîmelayên tarîperest yên Îranê şermezar bikin.

Hêjayî gotinê ye ku Îran yek ji wan welatan e ku li ser hêla erdhejê cih girtiye û bi taybetî bajarê Tehranê di metirsiya pêlên erdhejê de ye. Karnasên wî warî berdewam hişdaeriyan di warê rûdana erdhejê de didin karbidestên hikûmetî, lê hişdariyên micit ên wan li gel xurafatbêjî û xemsariya karbidest û melayên kevneparêz ên Komara Îslamî ber bi rû dibin. Ku wê carê serî li kincên jinan de derxist.

www.arsivakurd.org

## 5'mîn Festîvala Navnetewî Ya "Şîîr Istembol" Bi Dirûşma "Ax Welatê Min Û Mirov jî Netewa Min E" Birêve Çû

Roja 20 ê nîsana 2010 an, demjimêr pirês kunferansek li "Teksîm Hotêl Hîl"ê, bi boneya destpêka pêncemîn festîvala Navnetewî ya şîîristembol, bi amadebûna hejmarek berçav ji dezgehên ragihandin ên Turkiye birêve çû. Pirofsor.Dr. Exoz Baykera, Bûxazîçî, Zekî Salih Tombak, Letîf Îpozdêmîr, di peywendî di gel wê festîvalê axivîn û pişt re şaîîrên mêvan dan nasandin û li ser daxwaza nûçegihanan çend şaîîran, helbest xwendin ku pêkhatibûn ji, Nahîd Husênî, li Kurdistana Îranê, Mizefer Îzdemîr jî Turkiyê, Aram Hartunyam ji Ermenistanê, Êlîna Kasyan ji Okraynê, Xalid Derwêş ji Filistînê, Êlîna Popêsko ji Romanya.

Roja 21 ê Nîsana 2010 an, Festîvala Navnetewî a "Şîîristembol", bi beşdariya nizîk bi 70 helbestvanan li derve û navxwe yî Turkiyê destpêkir. Hêjayî gotinê ye ku tewera sereke ya diyalog û vekolînên îsal a festîvalê bo baskirin li ser şîîrên Îskandînaî hatibû diyarîkirin, lê seba borkana Îslendê şaîîrên wê deverê heya diwîn roj nekarîn beşdarî wê festîvalê bin.

Şaîîrên wê festîvalê bi ser çendîn giropan hatin dabeşkirin. Du şaîîrên Kurd ên mêvan, Dr. Bedirxan Sindî û Nahîd Husênî ku beşdarbûyên yek ji wan giropan bûn, bûne mêvanê dibistanek paşnawendî bi navê "Qasim Paşa" û şîîrên xwe kirin diyarî, bo keç û xortên wî bajarî.

Piştînîvroya yekemîn roja festîvalê, jinên şaîîr ên beşdarbû di festîvalê ku ji welatên ukrayn, Rûsiye, Bulxaristan, Danmark, Yûnan, Romanya û Kurdistanê de hatibûn her yekê bi zimanê daykî yê xwe, êware korek şîîrê li "nawenda endazyarên mikanîk liqa Istembolê", birêve birin.

Duyemîn roja festîvalê giropek ji helbestvanan ku herdu şaîîrên Kurd ên beşdar di festîvalê de têde bûn, bûne mêvanê Zanîngeha "Buxazîçî"ya bajarê Stembolê û korek gerim ya şêiran pêşkêş kirin. Piştre Hunermendê stranbêj û şaîr Mizefer Ozdemir, bi pêşkêş kirina çend şêir û sitranan, ew kor gerimtir kir. Hêjayî gotinê ye ku xwendevanên Zazak ên zanîngeha navhatî, bi bilindkirina dirûşma zimanê me jiyana me ye, pêşwazî ji mêvanan kiribûn.

Piştînîvroya wê rojê çendîn konferans birêve çûn. Hevdem giropek din ya şaîrên festîvalê, di hola şanoya "Seyra Mesel" ku xwediyên wê Kurd in, êware









korek bi navê "Şêirên Cîranan" birêve birin. Şaîrên beşdar di wê korê de pêkhatibûn ji, Nahîd Husênî ji kurdistana Îranê, Bedirxan Sindî ji Kurdistana Îraqê, Xalid Derwêş ji Filistîn, Ardêm Arutiyunyan ji Ermenistan, Berken Bereh ji Diyarbekir, Ancêlîkî Sîdîra Yûnan, Êlêna Popêsko ji Romanya, Muslîm Çilîk Turkiye, Emel Aytim û komek ji şaîîrên din ên Turkiyê.

Demjimêr 2 bo 4ê piştînîvro ya roja dawîn a festîvalê, taybet bû bi şîîrên şaîrên Kurd ên beşdar di festîvalê de li nawenda endazyarên mikanîk liqa Stembolê, ew êwarîkor ji aliyê Pirofsor. Dr. Bedirxan Sindî, Letîf Êpozdêmîr û Nahîd Husênî, bi kurtebasek li ser pêvajoya edebiyatê li başûr, bakûr, rojhelatê Kurdistanê û herweha xwandina şêirên Kurdî birêve çû. Civîna dawîn ya festîvalê, êwarîxanek bû ku ji aliyê birêvebirên festîvalê ve bo mêvanan hatibû amadekirin. Zekî Salih Tombak, dayrêktorê festîvalê sipasiya beşdarîkirina mêvanan kir û beşa dawîn, dabeşkirina xelatên Nazim Hikmet bo bi ser şaîrên mêvan de.

*Kaniya Helbestan*

## Mirgewerê Dil biêşê



**Bêwar Mirgewerî**

Mirgewerê Dil biêşê ,Dil keserê ...
Mirgewer to ey Axa Jînê,
Warê te li sînorê sê birînê
Çiya û Deştên te tev Sor gulin,
Qîz û xortên te ,tev sîmbolin
War û Kaniyên te tev Cenetin
Rûbarên te ,tev bi bereketin.

Dalampera Serbilind Warê Peymane,
ev Peymana çar Perçê Kuredistan e!
li wî warî ku Warê Kurdan e,
Wan sûnd xwar Kurd tev Birane
Mirgewerê Dil biêşê,
Dil keserê...

li Rojhilatê te Geliyê Xane,
cihê Qasimlo û Lepzêrînane
li Rojavayê te Şemzînane,
Warê Nehrî Û Şêx ubêydolayane
li Bakûrê te Deşt û Tirgewer,
ev Warê Zerdeştê Kurdane
li Başûrê te Xaka Barzane,
ev Qibleya tev Kurdane!

Mirgewerê Dil biêşê,
Dil keserê...
derdê dilê Bêwar zorin û gelek,
xemê dilê Bêwar bûne Birc û Kelek

www.arsivakurdi.org

# Kurdistan Wargeha Stran Û Awazan





**Mecîd Cînîkanlo**

Kurdistan welatê Kurdan seba hilkevta demogratîk û çîyayên bilind weke yek ji xweştirîn cihê Rojhilata Navîn tê hesibandin ku seba hebûna av û hewaya bedev, xwediyê deng, kilam û awazên xweşik û û zelal e.

Bi awayek gistî Kurdistan xwediyê çar awayên kilam û strana ye.

**Stran û sirûdên olî**

Çavkaniya sereke ya wan stranan bo olê destpêkîn yê Kurdan vedigere ku pitir ji çar curê sereke pêk tên wek hore, siyahçemane, heyran û lavik ku çavkaniya destpêkin a wan stranan, olên desitpêkîn yê mirovahiyê wek mîtrayîzm û zerdeştî ye. Ku bo berî îslamê vedigerin. Piranîya, hore siyahçemane, lavik û heyranên zimanê Kurdî wekheviyekî zaf li gel beytên" gata" kitêba pîroz ya zerdeştiyan heye. Gata di Kurmanciyê de bi wateya gazî tê mena kirin ku berê Moxên zerdestî bi xwendina wan stranan ji bo xelkê gaziya Zerdeşt ji xelkê re didan ragihandin.

**Staranên kar û barên rojan**:

Piraniya wan stranan xwediyê dîrokek kevnar in. Stranên han li xwezî û hêviyên însanan, jiyan û pêşeroj, xweşî û nexweşiya mirovan re hatine, havêtina meşkê, doşîna pez û çêlekan, wek pişkek mezin ji vê folklora Kurdan tê hesibandin. Beytên wan stranan ji zimanê Însanên herî sade hatine wergirtin û bi wêneyekî rastîn ji eşq, evîn û xweziyên ciwanên Kurd hatine çêkirin.

Parek din ji stranên kar û xebatê, ev stran in ku di dema kar û xebata rojane de çêkirine. Bo mînak strana "Hey Pale" li ser zeviyên çandiniyê hatiye strîn û stranvanê serekî bi gotina wan stranan qala kar û xebat jibo jiyanek bi rûmet dike.

**Stranên Erfanî**


Ev stran pitir derd û kulên arifên gelê me bûye û kesên wek Mamosta Ceferqulî Zengene ji vê awaya taybet mifah wergirtine. Stranên han pitir bi lihev kombûna mirovan di malan de, birêve çûye.

**Beytên tazî û laylayî yên dayîkan**

Jinên bitemen di dema mirina ezîz û xwestiviyan yan jî kesek hezkiriyê xwe de, stranên taybet dixwînin.

Laylayî: Dayîkên Kurd ji bo razandina zarokên xwe, bi xwendina laylayiyan wan dirazînin. Laylayiyên han zêdetir bas ji esq û wefaya dayîkê ji bo zarokên wan e û di kilamên han de, hest û soz û xweziyên xwe ji bo pêseroja zarokê xwe bi dengekî xweş tînin ziman. Dayîka dil biês di dema gotina wan stranan de, zarokên xwe jibo pêşerojê amade dike û wî/wê şîret dike ku bi serbilindî jiyanê bike û bi serfirazî ji vê dinê here. Hêjayî gotinê ye ku ev stranên laylayî zor car li navçe û herêman da ferq û ciyawazî hene.

# Pirtûka "Dilbeyar" Derket




Kitêba Letîf Epozdemir a 7’an ya helbestan ku keda çend sala ye, bi navê DİLBEYAR di nav weşanên Veng de derket.

Dilbeyar ji 140 rûpelelan û 95 helbestan pêk tê ku gelek helbestên dilînî, evînî û civakî li xwe de cih dide. Epozdemir li vê derheqê dibêje ku helbestên kitêbê hinek caran serbest in û gelek caran jî bi kêşe û qafiye ne. Dema mirov helbestan dixwîne mirov helbesta kilasîk a Kurdî jî bi vî navî tîne bîra xwe. Tikaye rexne û pêşniyazên xwe ji bo min bişînin. Ez bi dilşahî kitêbê pêşkêşî bîr û raya Kurdewarî dikim".

Hebek ji wê jî bo me hatibû şandin. Em jî spasî, berdewamî û serkevtinê ji hêja Latîf re dixwazin.

latifepozdemir@hotmail.com 0549-5031313

## Konferansek Navneteweyî li ser Wêjeya Kurdî tê lidarxistin



Serokê Zanîngeha Kurdistanê li Sine, Cehanşîr Emînî di civîneke de qala Yekem Konferansa Navneteweyî li ser Edebiyata Kurdî li wî bajar' de kir.

Emînî da zanîn biryara konferansê ji aliyê Şuraya çandî ya Parêzgeha Kurdistana Îranê ve hatiye dayîn ku konferans dê 5-6’ê Gulanê birêve biçe.

Di konferansê de dê 84 gotarên hilbijartî û pesendkirî bên xwendin ku ji wana 33 gotar Kurdî ne û 4 gotar jî farsî ne. 15 gotar dê ji aliyê nivîskarên îranî ve, 17 gotar ji aliyê nivîskarên iraqî ve û 10 gotar jî ji aliyê welatên Awistiralya,Tirkiye,Bulxaristan û Fransayê ve bên xwendin.

Konferans dê li hola zanîngeha Kurdistanê li Sineyê destpê bike. Pukmedıa.

www.arsivakurd.org

agiri

**Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne**

**http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php**
**Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.**
**Navnîşana derveyî welat:**
AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

**E - Mail: agiri2003@hotmail.com**
**agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com**



## UNESCO 6 Gundên Efrînê dixe nava Kelepûra Cîhanî






Rêxistina Neteweyên Yekbûyî bo perwerde, zanist û ronakbîriyê (UNESCO), ragihand ku 6 gund li Çiyayê Kurmênc a Efrînê dê têkevin nava kelepûra cîhanî.

Li gor nûçeya ajansa France Press'ê, "UNESCO dê 8 gundan li bakûrê Sûriyê têxe nava kelepûra cîhanî" ji 8 gundên han 6 li navçeya Efrînê li nav çiyayê Lêlûn de ne (başûrê Efrînê).

Navê wan 6 gundan jî ev in: "Berad, Kefer Nebo, Xerab Şemsê, Keleha Sem'an, Birc Heyder û Şêx Berkat".

Tê zanîn ku berî çend salan di 2002'an de kenîseya Julyanos û gora Mar Maron (347-410 z) li gundê Beradê hate dîtin, Mar Maron damezrînerê tîreya Maroniyan e ku piraniya kirîstiyanên Libnanê ji rêbaza wî ne.

Her çend deverên Çiyayê Kurmênc xwedî nirxek geştewarî yên dewlemend bi mêrg û kanî, deşt û çiya ye, û herwiha şûnwarên kevnar, weke Şikefta Duderiyê, Nebî Hûrî, Keleha Sem'an, Gira Endarê û… jî hene, lê gingî û pûtedana pêwîst bi wan deveran him ji aliyê dewletê û him jî xelkê deverê (yên girîngiya van şûnewaran nizanin ve) nahê dayîn, lewma geleg ji wan winda dibin.

## Ji Milyarekê Bêtir Mîrov Birçîne!...



Li Cîhanê hejmara mîrovên birçî milyarek derbas kiriye.

Berpirsê Rêxistina Xorek û Çandiniyê ya NY, "Jacques Diouf "di vekirna Konferansa 31' mîn a RXK li Panamayê de da zanîn ku mixabin li gor sala borî hejmara mirovên birçî 150 milyon zêdetir bûye û ev hejmar bi ser milyarekê ketiye. Ji van mirovên birçî, 642 milyon li Asya, 265 milyon kes jî li Afrîqa, 42 milyon kes jî li Amerîkaya Latîn û Karaîbe û 15 milyon birçî jî li dewletên pêşketî de dijîn. Bi taybet birçîbûn li Komara Kongo, Erître û Haîtî de heye û ev welatandi rewşeke pirr xeter de ne, ku xelkê Kongo % 75, xelkê Erître ji % 66 û xelkê Haitî jî ji %58 birçîne."

Diouf, dibêje ku "Divê dewletên pêşketî polîtîka xwe ya xurekiyê di ber çavan re derbas bikin û vê polîtîkayê biguherin. Heta sala 2050'ê hejmara gelheya cîhanê digihîje 9.1 milyar mîrovan. Li gor vê divê hilberîna xurekî û kiştûkalî ya dewletên pêşketî ji % 70 û dewletên din jî ji % 100 bêtir bibe heya ku têrî cîhanê bike. **Netewe**


## Barzanî: Ya Baş Ew E Ku Îraq Bibe Sê Herêmên Federal



Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî, di hevpeyvînekê digel rojnameya "Newyork Times" ya Amerîkî de bal kişande ser yekalîkirina pirsên navbera Hewlêr û Bexdayê û anî ziman ku ew ji bo pêkanîna hikûmeta nû ya Iraqê bi awayekî şirîktî, amade ne ku digel aliyên siyasî yên Iraqê hevpeymaniyê pêk bînin.

Serokê Herêmê tekîd kir ku mehale Kurd beşdarî yan jî piştgiriya hikûmeteke wek ya berê ya Iraqê bikin. Di heman demê de Barzanî baweriya xwe anî ziman ku take hêviyek ku maye ji bo aramkirina Iraqê, dabeşkirina Iraqê ye bi ser sê herêmên federal de û wiha dom da axaftina xwe: "Dikare Kurd li bakur, Erebên Sune li naverast û rojava û Şîa jî li başûr herêmên xwe ava bikin. Her wiha dikare Bexda jî bibe paytexta federalî ji bo bicîhanîna erkên sereke yên hikûmetê." Di heqê madeya 140'ê de jî Barzanî got: "Eger madeya 140'ê neyê bicîhanîn, ew tê wateya hiloşîna destûr û Iraqê." **Pukmedia**

## 5 Hezar Mal Li Agiriyê Di Bin Ava Baranê De Man



Li Agirî û derdorên wê 3 rojan bê navber baran bariya û di encam de lehî rabû û nêzîkî 5 hezar mal di bin avê de man. Bi Taybet taxên Tokî, 100. Yıl, Kazım Karabekir û Fatih û … di bin avê de mane. Her wiha bi hezaran kes jî xesar dîtine.

## Topeke Fotbolê 6 Ciwanên Kurd Di Çemê Diclê De dan Fetisandin



Li gor ajansa Peyamnêr, li devera Pêşabîrî li nizîk bajarê Zaxoyê, termê 3 ciwanên Kurd ên Sûriyê hatin dîtin.

Piştî vekolînan hat zanîn ku li gundê Eyngeverî a ser sînorê Sûriyê 6 ciwan mijûlî fotbolê bûne û topa wan çûye nav ava çemê Diclê. Yek ji wan xwe avêtiye topê û di avê de fetisiye û ewên din jî yek bi yek xwe bi dûre avêtine nav çem ku wî rizgar bikin. Di encam de her şeş di avê de fetisîne.

Hêjayî gotinê ye ku 4 ji wan 6 kesan birayên hev û 2 jî kurmamên hev bûne û temenê her şeşan serweyî 18 saliyê bûye. Li gor heman çavkaniyê heya niha termê 3 ji wan hatiye dîtin û 3 ên din jî hêj nediyar in.

www.arsivakurdi.org